



Bernameya lînêrîn û çavdêriyê

KURMANJI

Bernameya lînêrîn û çavdêriyê bernamêyeka pîşeyî ye û bidestxistina dîplomêya pîşeyî armanca wê ye.

Bernameya lînêrîn û çavdêriyê ji te re ye yê ku hez dîke di warê lînêrîna tenduristî û nexweşan, psîkiyatîrî û çavdêriya pîran de û li gel kesên seqet kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pîşeyî berdeham bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursan bixwîni da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomîni.

Îmkana pisporîbûnê

Ti pisporî di vê bernamêyê de nînin, lê bernamê îmkânê dîde te ku tu bibî pispor. Bernamê îmkânê dîde ku tu di warê, bo nimûne, seqetiyên, lînêrîna tenduristî û nexweşan, psîkiyatîrî û çavdêriya pîran de û li gel kesên seqet kar bikî.

Tiştên ku tu di vê bernamêyê de fêr dibî

Tu dê zanyariyan li ser tenduristî, netenduristî, seqetî, derman, perwerde û psîkolojiyê werbigirî. Tu dê zanyariyan li ser pêdviyên cuda yê mirovan werbigirî û giringiya awayê jiyanê ji bo tenduristiyê fehm bikî. Tu dê fêr bibî ka çawa bi awayekê pîşeyî miameleyê bi mirovan re bikî.

Bona mirov xwe ji ziyarîna karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernamêyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bernameya weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernamêyên pîşeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernamêyên pîşeyî de, tu dê zêdetir madeyên pîşeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bîngehî xwendine bixwîni.

Madeyên taybetmend yê hevbeş yê bernamêyê ev in: tenduristî, derman, mirov, psîkiyatîrî, psîkoloji, zanyariyên civakî, perwerdeya taybetî, zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û lînêrîn û çavdêrî.

Îmkân heye ku tu di bernamêyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamêkûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendîngehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dîde.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwîni hilbijêrî. Ji xwendîngehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê di bernameyê de xwe hîn bikî ku wezîfeyên ji bo jiyana karî şert in, wek alîkariya di lènêrîna şexsî de, wezîfeyên teknîka tibê, wezîfeyên malê û wezîfeyên îdarî û civakî bikî.

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîfîgirtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyên zêdetir li ser îmkanên birêvebirina şîrketeka şexsî werbigirî. Tu dê xwe hînî plankirin, pêkanîn û dokumentkirina karî bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawîya Bernameya lènêrîn û çavdêriyê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartîye de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendîye li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêr 15 hefteyan li cihek yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendîngeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêr nîva xwendina xwe li cihek yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bîdestxistina şertên bîngehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendîngeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew kurseka zîmanê swêdî yan swêdî wek zîmanê duyê û kurseka zîmanê îngilîzî ye. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.